

Mele Mihemedê Neyo**Ji nav me bar kir**

Roja çarşemê, 16.05.2007an, li paytexta welêt Şamê, dilê xebatkarê kurd ê dengewar **Mele Mihemedê Neyo** rawestî. Seydayê buhiştî, ciwaniya xwe û piraniya temenê xwe, di ber doza gelê xwe yê dadmend de derbas kiriye, gelek cefa, girtin û veşartin di riya xebatê de dîtine. Gelê kurd jî, tucarî xebatkarên xwe ji bîr nake, nûnerên tevgera kurd digel cemawerekî mezin, pêşwaziya termê seyda li derveyî bajarê Qamişlo kirin, ew di mezê Hilêliyê de sipartine axa welêt. Gotin bi navê Hevbendîya kurd, Bera kurd û komîta Tensîqê ... û hine dîtir, derbarî têkoşîn û xebata Seyda hatin pêşkêşkirin .

Bila cihê te buhşt be seyda, serê meriv, malbat, dost û hevalên te sax be.

**Helbestvanê Kurd****Seydayê Keleş koç bar kir**

Roja Duşemê 18.06.2007an, dilê helbestvanê kurd Sedayê Keleş piştî 77 salan rawestiya. Mele Hisên (Sedayê Keleş), li gundê Bizgûrê, sala 1930 ji dayik bûye, ji piçûkaniya xwe ve dest bi hînbûna xwendina olî kiriye, paşê guh li ziman û wêjeya kurdî daye, hevaltî û dostaniyeke xurt di navbera wî û Sydayê Cegerxwîn de çêbûye û di tevgera kurdî ya rêzanî de cih girtiye, kar û barê kurdewariyê hilgirtiye ser milên xwe ji dil û can, bi dilsozî, ta roja dawî ji temenê xwe, ji bo doza gelê xwe kar û xebata rêzanî û wêjeyî kiriye.

Ji berhemên Seyda yê çapkirî: Em û dijmin, Rêka gel, Derdê millet, Ronahî, Xebat, Gotinên pêşyan. Yê destnivîs: Helebçe, Berbang, baxistan, Bîranînên min.

Piştî nîvro, bi beşdariya hizaran ji dost,

heval, rewşenbîr û nûnerên tevgera kurdî li Sûriyê, laşê seydayê keleş, di goristana Qidûr Beg de hate veşartin. Gelek gotin, helbest û birûsk hatin xwendin, mîna: Gotina Bera kurdî, Komîteya Tensîqê, partiya pêşverû ya kurd, Rewşenbîr û nivîskarên kurd, gotina Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yê li Sûriyê têne weşandin, helbesteke şêrîn ji bal seyda Rifet ve hate pêşkêşkirin, seydayê Mele Elî helbesteke seydayê Keleş ji beşdaran re xwend...û gelekên dîtir, bi gotina malbatê, rê û resmê veşartinê bi dawî hat.

Li jêr, em deqa gotina kovar û weşanên bi zimanê kurdî yê li Sûriyê têne weşandin didine belavkirinê:

*Îro, em bi dilên xemgîn û şikestî, xatirê dawîn ji mamosteyê xwe, **Sedayê Keleş** dixwazin.*

*Navê **Sedayê Keleş**, di asîmanê helbest û wêjeya kurdî li Sûriyê de, navekî berz, bilind û rûmetdar e, çimku, wî temenê xwe, ji bo xebatê di ber doza gelê xwe û zimanê kurdî yê şêrîn de terxandibû, helbest û gotarên wî, kovar û weşanên me dixemilandin, dilê xwendevanên zimanê kurdî bi wan geş û şa dibû. Herweha, wî xwe di warê folklor û kelepûra kurdî de jî westandibû.*

Bêgomane ku, bi saya serê mezin comerdên me, îro em bi zimanê dayika xwe dixwînin û pê dinivîsin û karwanê rewşenbîriya bi zimanê kurdî bi rêve dice.

Bi navê Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yê li Sûriyê têne weşandin, em serxweşiya xwe, malbat, dost û hevalên Seyda dikin, ji Xwedê tika dikin ku cihê seydayê me buhuştê rengîn be û serê we hemiyar sax be!

Kovar û weşanên bi zimanê kurdî yê li Sûriyê têne weşandin

